Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar :752 14-Nîsan- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Xwediyên jeneratoran dest bi însiyatîfa perenegirtina ji gel kirin



**Di çarçoveya însyatîfên ku welatiyên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tînin de, welatiyekî bajarê Hesekê diyar kir ku heta mehekê pereyên eleketîrêkê ji welatiyan nastîne.**

Li gel qedexeya ku ji bo pêşîgirtina li belavbûna Koronaîvursê li herêmê hatiye ragihandin, Însyatîf û projeyên hevgirtina civakî bi armanca piştgiriya welatiyan û malbatên xizan, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dewam dikin.
Di vê derbarê de, welatiyê bi navê Raman Meo ku ji şêniyên taxa Salihiyê ya bajarê Hesekê ye, dest bi însyatîfekê kir û wê heta mehekê pereyên eleketrîkê ji welatiyan nestîne.
Derbarê mijarê de ji şêniyên taxê Şîndar Seed Elî wiha got: "Her tişt biha bûye û li şûna ku alîkariya welatiyan bikin, bazirgan bi nirxên madeyan dilîzin. Divê dest bi însyatîfên mirovî weke ya xwediyê jeneratorê, bikin. Divê xwediyên jeneratoran yên din jî tevlî vê însyatîfê bibin.

## WHO berûvajî destûr û rêgezên xwe tev digere

Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) îdia dike ku li gorî rêgezên destûrê dimeşe, ango bê ku cudabûnê bixe navbera mirovan parastina mafên mirovan dike. Lê di rastiya xebata xwe de ne wisa ye û mafên mirovan binpê dike.



Li seranserê cîhanê Koronavîrus (Covid-19) bûyera herî girîng e û yekîtiya tevayiya cîhanê bi xwe re ava kir. Lê Rêxistina Mafên Mirovan û WHO ku rêgez û destûrên van rêxistinan li ser esasê mirovî hatine avakirin, ne wisa ye û berûvajî karê xwe tev digerin. Îsbata vê yekê jî, di demeke wiha de ku pêwîstiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi alîkariyê heye ku parastina xwe ji Koronavîrûsê bike, rêxistinên tenduristiyê û yên parastina mafên mirovan bêdeng in.
Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê 13'ê Adarê sindoqa alîkariya têkoşîna li dijî vîrûsê ragihand û bi armanca hevkariya kar û xebata cîhanî û parastina mirovan ji xetera vîrusê, destek da.

### WHO PÎVANAN BINPÊ DIKE

WHO Tîrmeha 1946'an bi armanca piştgiriya qada tenduristiyê, bê cudabûn parastina gelan bike, herwiha cudabûnê nexe nava olan, siyaset, aborî û civakî hat avakirin. Lê di rastiya xwe de berûvajî rêgezên xwe tev digere. WHO li ser bingeha rêgezên li jor hatine diyarkirin, îsbata girêdana xwe bi rêgezên di destûrê de hatine diyarkirin, dike. Herwiha rêxistinê îşaret bi parastina selametiya tevayiya gelan dike, xwe dispêre hevkariya di navbera ferd û dewletan de û alîkariyên tibî dide her kesî.
WHO tevî ku destek da hikumeta Sûriyê û çeteyên dewleta Tirk ên bi navê "opozîsyona Sûriyê" lê heta niha ti alîkarî nedaye herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê da ku pêşî li belavbûna Koronavîrusê bigire.
Hevserokê Desteya Tenduristiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ciwan Mistefa diyar kir ku têkilî di navbera wan û Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê de heye, di demên dawî de gelek civîn bi hev re li dar xistin, Rêxistinê soza pêşkêşkirina alîkariyê da lê heta niha tiştek pêk neaniye.

## Rêxistina AVC'ê li Kobanê navendeke karantînayê vekir

**Rêxistina AVC'ê bi alîkariya desteya tenduristiyê ya herêma Firatê li gundê Helincê navenda Karantînayê vekir.**

**Piştî belavbûna Vîrûsa Korona li cîhanê desteya tenduristiyê ya herêma Firatê bi armanca parastina gel ji Vîrûsa Korona li herêmê tedbîrên pêwîst girtin. 2 navendên Karantînayê û navendek ji bo rewşên awarte li Kobanê vekirin. Îro jî rêxistina AVC bi alîkariya desteya tenduristiyê ya herêma Firatê li gundê Helincê yê Rojhilatê Kobanê navendeke din ya karantînayê vekir.**

**Di navendê de 50 text, 2 Ambûlans, 4 bijîşk û 6 hemşîre hene.**



## Serokkomarê Elmanya: Ev ne şer e, testa mirovayiyê ye


Serokkomarê Elmanya Frank-Walter Steinmeier têkildarî pandemiya Covîd-19 daxuyaniyek da û berûvajî Serokkomarê Fransa got, "Ev ne şerek e, ev testa mirovayiyê ye."

Steinmeier ku kêm caran ji televizyonê re diaxive, di axaftineke xwe de got, "Nexêr, pandemî ne şerek e. Netewe li ber neteweyeke din ranabin, leşker li ber leşkerên cuda ranabin. Ev testeke mirovbûna me ye."
Serokkomarê Elmanya diyar kir ku vê krîzê "aliyên herî baş û aliyên herî nebaş" ên mirovan raxistine ber çavan û bi gotina "Em nîşanî hinekî din bidin ku di nava me de yên baştir hene" bang li welatiyên xwe kir.
Steinmeier wiha axivî, "Ji kerema xwe re vê li Ewropa jî nîşan bidin, eger cîran bi xurtî ji nava vê krîzê rizgar nebe, Elmanya jî wê nikaribe jê rizgar bibe.



Serokkomarê Elman got, "Em Elman ne tenê hatin vexwendin ku li Ewropa piştgiriyê bikin, ji xwe em neçar in vê bikin."
Serokkomarê Fransayê Emmanûel Macron meha Adarê bi daxuyaniyekê ragihandibû ku ew li dijî pandemiyê di şer de ne û pêkanînên mayîna li malê li tevayiya civakê belav kiribû.

## Kongreya Star dayîka Ûweyş bîr anî



Koordînasyona Kongreya Star – Rojava dayîka Rêber Abdullah Ocalan, Ûweyş di salvegera wefata wê ya 27'an de bîr anî û got, "Dayîka Ûweyş wê weke nimûneya lehengî û serfiraziyê bimîne, bi saya wê riya me ya ber bi azadiyê ve ronî bû."*R-3*

## KCK: Divê derbarê tenduristiya rêber Ocalan de agahî were girtin

KCK'ê bi daxuyaniyekê bal kişand ser rewşa rêber Abdullah Ocalan ku di dema pandemiya Koronavîrûsê (Covid-19) de agahî jê nayên girtin û wiha diyar kir: "Niha têkildarî tenduristî û ewleyiya Rêberê Gelê Kurd ti agahî nayên girtin. Di dema koronavîrûsê de mafê herî xwazayî ye ku malbat û parêzer derheqê tenduristî û ewleyiyê de agahiyê bistînin." *R-4*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 752 14-Nîsan- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

## HRE'yê nasnameyên 3 şervanên xwe yên şehîd eşkere kirin

Hêzên Rizgariya Efrînê nasnameyên sê şervanên xwe yên di bersivdayîna êrîşên artêşa Tirk a dagîrker yên ser navçeya Şêrawa de şehîd bûyîn eşkere kirin. *R-2*



# 60 HEZAR QEDEXEYA DERKETINÊ DIŞOPÎNIN

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê qedexeya derketina derve di roja 25an de didome. Heta niha li herêmê nexweşên bi vîrûsa Koronayê nehayomr . Rêveberiya Xweser a ku heta niha desteka ji WHO'yê negirtiye bi derfetên xwe tedbîrên li dijî vîrûsê didomîne. Lê hikûmeta Sûriyê û Tirkiyê hewl didin vîrûsê derbasî herêmê bikin. *R-2*



## Girtiyê Kurd Selîmî hat darvekirin



Girtiyê Kurd Mistefa Selîmî ji zindana Seqiz bi komek girtî re reviyabû. Pişt re ji aliyê hêzên ewlekariyê yên Herêma Kuristanê ve hatibûn binçavkirin û wan jî radestî rejîma Îranê kiribûn. Mistefa ji aliyê Îranê ve hat darvekirin. *R-2*

## Malbatên Şehîdan: Şandina cenazeyê şehîd Egîd bi pakêtekê derveyî exlaq e

Meclisa Malbatên Şehîdan a Herêma Cizîrê diyar kir ku şandina cenazeyê şehîd Egîd Îpek bi riya pakêtekê ji hêla dewleta Tirk ve kiryareke derexleqî ye. *R-5*

# Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tedbîrên li dijî Koronavîrûsê

**Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê qedexeya derketina derve hê didome. Heta niha li herêmê nexweşên bi vîrûsa Koronayê nehatine tesbîtkirin. Rêveberiya Xweser a ku heta niha desteka ji WHO'yê negirtiye bi derfetên xwe tedbîrên li dijî vîrûsê didomîne. Lê hikûmeta Sûriyê û Tirkiyê hewl didin vîrûsê derbasî herêmê bikin.**

Vîrûsa nû Korona (Covid-19) cara yeke li bajarê Wuhanê yê Çînê 17'ê Cotmeha 2019'an de hat dîtin. Destpêkê cîhanê giraniyeke mezin neda têkoşîna li dijî vîrûsê û bi cidiyet mijar negirt dest. Vîrûs di nava kêmtirî mehekê de li seranserê cîhanê belav bû û veguherî "Pandemiya global".
Heta roja yekşemê li seranserê cîhanê 110 hezar kes bi vîrûsê mirin û li derdora milyon û 800 hezarî jî pê ketin. Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ti nexweşên Koronayê nehatine tesbîtkirin.

**JI BO VÎRÛS LI BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYÊ DERNEKVE BI LEZ KETIN TEVGERÊ**

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo ku vîrûs li herêmê dernekve bi lez ket seferberiyê. Di vê derbarê de heta niha 44 biryar dane û tedbîrên ewleyî û tenduristî zêde kirine.
Rêveberiyê 11'ê Adarê biryara jimara 15'an derxist, tê de girtina deriyên sînor ên bi herêmênê rêveberiyê re ragihand.
Rêveberiya Xweser 12'ê Adarê biryara jimara 23'yan derxist. Li gorî vê biryarê dibistan û zanîngeh dikevin betlanayê da ku rê li ber kombûnê were girtin. Herwiha navendên perwerdeyê dezenfekte kirin.

**ŞANEYA ALOZIYÊ HAT AVAKIRIN**

Piştî van her du biryaran, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê 14'ê Adarê bi biryara 27'an Şaneya Aloziyê bi armanca birêvebirina vê pêvajoyê ava kir.
Di roja 15'ê Adarê de Rêveberiya Xweser biryara jimara 28'an da. Di vê biryarê de ragihand ku navend û saziyên rêveberiyê 3 rojan tên girtin, da ku werin dezenfektekirin.
Li gorî birayra jimara 28'an a 19'ê Adarê dabû, qedexeya derketina derve li tevayiya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat



dayîn.

**JI BER QEDEXEYA DERKETINÊ DESTEKDAYÎNA WELATIYAN**

Ev biryar 23'ê Adarê pêk hat. Di vê çarçoveyê de tevahî deriyên sînor hatin girtin, çûn û hatina nava bajaran hat rawestandin, derketina derve hat qedexekirin, ji bilî dokanên madeyên xwarinê, firne, nexweşxane, dermanxane û navendên tenduristiyê dikan tev hatin girtin.
Roja 25'ê Adarê rêveberiyê biryareke din derxist, tê de destûr da ku bûroyên pevguhestina pereyan bûroyên xwe vekin.

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di biryara jimara 30'î de, diyar kir ku wê di dema qedexeya derketina derve de madeyên xwarinê pêşkêşî malbatên ku debara xwe ya jiyanî li ser karê xwe yê rojan peyda dikin, bikin.

**60 HEZAR ENDAMÊN HÊZÊN EWLEKARIYÊ QEDEXEYA DERKETINÊ DIŞOPÎNIN**

Bi armanca ku biryara qedexeya derketina derve baş bi rê ve biçe, Hêzên Ewlekariya Hundir a Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêdetirî 60 hezar endamên xwe xistin tevgerê. Li gorî Hevserokê Desteya Hundir a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Elî Heco biryara qedexeya derketina derve ji sedî 80 pêk tê.

**NAVENDÊN KARANTÎNAYÊ HATIN AMADEKIRIN**

Desteya Tenduristiyê ji bo kesên ku ji derve tên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê navendên karantînayê vekirine. Kesên ku ji derveyî tê dê 14 rojan di van navendan de bimînin. Her wiha hin holên dawetan jî veguherî karantînay. Li gorî desteyê heta niha 8 navendên karantînayê hatine amadekirin.
Rêveberiya Xweser di 10'ê Nîsanê de, piştî ku hêzên hikûmeta Sûriyê leşkerek ku leşkertiya wî bi dawî bibû û gumanê vîrusê li ser wî hebûn derbasî gundê Um El-Hoş ê Şehbayê kir, gund xist karantînayê.

## Girtiyê Kurd Selîmî hat darvekirin

Girtiyê Kurd Mistefa Selîmî ji zindana Seqiz bi komek girtî re reviyabû. Pişt re ji aliyê hêzên ewlekariyê yên Herêma Kuristanê ve hatibûn binçavkirin û wan jî radestî rejîma Îranê kiribûn. Mistefa ji aliyê Îranê ve hat darvekirin.
Girtiyê Kurd Mistefa Selimî 27'ê Adarê bi gelek girtiyên din re ji zindana Seqiz fîrar kiribû û paşê li ser sînorê Başûrê Kurdistanê radestî Îranê hatibû kirin.

Li gorî tevna Mafê Mirovan a Kurdistanê, Mistefa Selîmî roja Înê danê sibê li zindana Seqiz hatiye darvekirin. Heman çavkaniyê ragihand ku cenazeyê Mistefa radestî malbata wî hatiye kirin.
Li gorî tevna Mafê Mirovan a Kurdistanê dema Misetefa Selîmî bi komek girtiyên din re ji zindana Seqiz firar dikin, bi çend kesan re berê xwe dabûn Başûrê Kurdistanê. Lê ji aliyê hêzên ewlekariyê yên Herêma Kurdistanê ve hatibûn binçavkirin û radestî Hikumeta Îranê kiribûn.
Selîmî ji sala 2003'yan ve bi egera pirsgirêkên civakî hatibû girtin û dihat gotin, endamê hizbeke Kurdî ye. Hizba Demokrata Kurdistanê, Hizba Demokrata Kurdistan a Îranê û rêxistina Kurdistanê a Hizba Komînîsta Îranê (Komele) diyar kiribûn ku Mistefa Selîmî ne endamê wan



e.
Li gorî çavkaniyeke taybet ku agahî daye Rojnewsê, Selîmî dema bi komek girtî re firar dike, berê xwe dabû sînorê Başûrê Kurdistanê. Lê ji aliyê hêzên Herêma Kurdistanê ve li sînorê navçeya Pênciwên tê binçavkirin û dişînin Rojhilatê Kurdistanê.

## HRE: Li Şêrawa 3 leşkerên Tirk hatin kuştin



HRE'yê roja Şemiyê li navçeya Şêrawa ya Efrînê li dijî leşkerên artêşa Tirk a dagîrker du çalakî li dar xistin. Di çalakiyan de 3 leşker hatin kuştin, 3 leşker jî birîndar bûn.
Daxuyaniya HRE'yê ya têkildarî mijarê wiha ye:
"Roja 11'ê Nîsanê hêzên me li navçeya Şêrawa ya ser bajarê Efrînê li dijî artêşa Tirk a dagîrker çalakiyeke taybet û çalakiyeke sabotajê li dar xistin. Di encama van çalakiyan de 3 leşker hatin kuştin, 3 leşker jî birîndar bûn. Herwiha 2 jê doçka lê barkirî, bi giştî 3 seyare jî hatin roxandin.
Ev her du çalakî ji bo tolhildana 3 hevalên me (Egît Şerqiya, Ferman Bilbilê, Xabûr Efrîn) yên di êrîşa 10'ê Nîsanê ya ser navçeya Şêrawa de şehîd bûyîn, hatine lidarxistin.
Herwiha artêşa dagîrker û çeteyên wê bi çekên giran, qadên sivîlan bi dijwarî topbaran dikin. Di van topbaranan de welatiyekî sivîl birîndar bû."

## Berpirsên balafirgehê xebata tîmên tenduristiyê asteng kirin

Berpirsên balafirgeha Qamişlo yên rejima Sûriyê xebata tîmên tenduristiyê yên ku testa kesên ji Şamê tên re çêdikir, asteng kirin.
Tîmeke tenduristiyê roja Yekşemê piştî nîvro gihîşt balafirgeha Qamişlo ji bo testa keşifkirina vîrûsê Koronayê ji bo kesên ji Şamê hatîn çêke.
Berpirsên balafirgehê ya di deste hikûmeta Sûriyê de xebata tîmê asteng kirin. Ji ber wê endamên tîmê neçar man ji balafirgehê derkevin û testan li benda nêzî balafirgehê temam bike.
Berî çend rojan Desteya Tenduristiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê helwesta hikûmeta Sûriyê ya revandina kesên ji derve tên û koordînenekirina bi rêveberiyê re rexne kiribû.

## Li Erebistana Siûdî 150 prens bi vîrûsê ketin!

Li Erebistana Siûdî, tê gotin ku vîrûs bi malbata qraliyetê ketiye. Rojnameya New York Tîmesê îdîa kir ku 150 prensên Erebistana Siûdî bi vîrûsa Covîd-19 ketine. Rojnameyê ev îdîaya xw spart çavkaniyên tenduristiyê. Di nava prensên bi vîrûsê ketîn de waliyê Riyadê û di heman demê de biraziyê Qral Salman Faysal Bîn Bender Ebdulazîz jî heye. Ebdulazîz ku herî kêm 70 salî ye, tê gotin di servîsa awarte ya nexweşxaneyê de ye.



Karsazekî li Kendavê ku bi rêkûpêk serdana Erebistana Siûdî dike got, "Ez bi şexsî zanim ku prensek li nexweşxaneyê ye. Herwiha zanim ku gelek prens nexweş in. Ji bo hişyarkirinê gelek telefon ji min re tên ku dibêjin nexweşî belav bûye."

**QESRA QRALIYETÊ DI PANÎKÊ DE YE**

Yek ji çavkaniyên nêzî Qesra Qraliyetê ji rojnameya Le Fîgaro re axivî û diyar kir ku zêdeyî 150 kesî ji qesrê bi vîrûsê ketine. Çavkaniyê got, "Zêdeyî 150 prens ku hin ji wan payebilind in bi vîrûsê ketine. Derdora Qral Salman û prensê velîehd Mûhammed Bîn Salman ketine panîkê. Ji ber wê jî tedbîrên hişk standin."

## Ceneze piştî 3 salan bi riya PTT'ê ji malbatê re şandin

Serdozgeriya Tirk ya Dêrsimê piştî 3 salan cenazeyê Agît Îpek xist pakêteke kargo û bi riya PTT'ê ji malbatê re şand.
Cenazeyê Agît Îpek (Kemal Berxwedan) yê HPG'yî ku di operasyona leşkerî ya 23'yê Gulana 2017'an de li Girê Xelasor a Dêrsimê jiyana şehîd bûbû, piştî 3 salan ji mallbatê re şandin. Serdozgeriya Komarê ya Dêrsimê piştî encama testa DNA'yê li ATK'e ya Stenbolê, bi kargoyê hestî xistin pakêtekê bi riya PTT'ê ji Serdozgeriya Komarê ya Amedê re şand. Cenazeyê Agît Îpek ku 2'yê Adarê ji Dersimê şandin Amedê, 10ê Nîsanê teslîmî malbata Îpek a li taxa 5 Nîsanê ya navçeya Rezan a Amedê kirin.
Gulana 2019'an rayedarên dewleta Tirk ya dagîrker li malbatê



geriyabûn û diyar kiribûn ku cenazeyek hatiye dîtin. Li ser vê malbat çûbû Dêrsimê û ji bo testa DNA'yê xwîn dabûn.



# "Rewanê Resen" çanda pêkhateyên herêmê îfade dike

**Hunermendên Kurd û Ereb bi berhemeke hevpar çand û mîrasa dewlemend a herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê destnîşan kirin. Berhem wê peyamê dide ku "Pêkhateyên li ser xaka pîroz dikarin bi hev re bi aştî bijîn."**



Hunergeha Welat, 12 hunermendên Kurd û 12 yên Ereb ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li Kela Cabirê ya li bajarê Tebqayê li rex çemê Firatê anîn cem hev û bi navê "Rewanê Resen" berhemeke nû derxist.

Berhema "Rewanê Resen" ji gelek stiran ji mîrasa Kurd û Ereb ên herêmê pêk tê. Hunermendên Kurd di vê berhemê de gelek stiranên gelerî yên Kurdî, weke stirana "Hoy Hoy Mamo Ebasî" ya navdar û hunermendên Ereb bi dengê zelal strana "Emî ya Beyai El-Werid", herwiha bi hev re stirana merdelî "Seadî" dibêjin.
Kîpa "Rewanê Resen" ji Wargeha Şehîd Welat hatiye tomarkirin û ji aliyê endamê Tevgera Mezopotoma ya Çand û Hunera Demokratîk Bêkes Darî ve hatiye amadekirin.
Mûzîkjen Bêkes Darî li ser vê berhemê diyar ki ku gelek zehmetî di dema amadekirina berhem de dîtine. Darî kêfweşiya xwe bi serkeftina berhem anî ziman.
Darî diyar kir ku armanca wan ji vê berhemê ew ku vê peyamê bidin ku "Pêkhateyên li ser vî erdî dikarin bi hev re bi aştî bijîn."
Darî bîr xist ku kilîpa "Rewanê Resen" li Kela Cabirê hatiye kişandin û got: "Xweza ya kelê pir xweş e û xwedî nirxekî manewî ye. Kele di dema dagşrkirina DAIŞ'ê de veguherîbû cihê tarî û zulma li ser jinan. Herwiha çeteyên DAIŞ'ê kele kiribûn girtîgeha kuştin û işkencekirinê."
Xebata amadekirina berhema "Rewanê Resen" 6 mehan dewam kir, klîp di nava 4 rojan de hat kişandin. 50 lîstikevanên ji Tevgera Mezopotamiya ya Çand û Hunerên Demokratîk, koma Şehîd Welat di vê berhemê de cih girtin. Herwiha 200 kesyaetên din ji herêma Tebqayê di nav de rûspiyên Ereb bi kon, hêştir, alavên dîrokî jî beşdarî kilîpê bûn. Hêzên Ewlekariya Hundir li ser ewleyî û parastinê sekinîn.

## Li Îlamê ya Rojhilat pêşbirka mihrîcana helbesta zarokan

Li bajarê Îlamê yê Rojhilatê Kurdistanê wê pêşbirka 'Mihrîcana Helbesta Kurdî Minal' bê lidarxistin. Ji bo parastin û xurtkirina zimanê dayîkê, Mihrîcana Çaran ya Helbesta Kurdî tê lidarxistin.
Saziya Komeleya Helbest û Edebiyata Eywan ya Îlamê bi hevkariya Ofîsa Çand û Irşadê ya bajêr û piştgiriya Midûriyetiya Giştî ya Çand û Irşadê ya Îlamî wê pêşbirk û 'Mihrîcana Helbesta Kurdî Minal' li dar bixe. Wê di çarçoveya 'Mihrîcana Helbesta Kurdî Minal' de di heman demê de pêşbirka helbest, xwendina helbestê û afîşa derbarê 'Mihrîcana Helbesta Kurdî Minal' bê lidarxistin. Ji ber Vîrûsa Koronayê dîroka mihrîcanê nehat diyarkirin lê berhemên ji bo pêşbirka 'Mîhrîcana Helbesta Kurdî Minal' divê heta dawiya hezîranê bên teslîmkirin.
Helbestkarên ji her çar parçeyên Kurdistanê dikarin beşdarî pêşbirkê bibin. Di heman demê de zarok jî dikarin bi helbestên xwe û bi xwendina




helbestê beşdarî pêşbirkê bibin.

Bernameya Mihrîcanê û şertên wê wiha ne:

"*Di beşa yekê de ji her çar parçeyên Kurdistanê Helbestvan bi helbestên xwe yên ji bo zarokan nivîsîn dikarin beşdarî pêşbirkê bibin.
*Di beşa duduyan de zarokên temenê wan bûyî15 dikarin bi helbestên xwe beşdar bibin. Zarokên ku wê beşdar bibin divê wêneyê nasnameya xwe jî bişînin.
*Zarok dikarin helbestên xwe bixwînin û bi riya videoyê bişînin. Zarokên bê hilbijartin wê bên xelatkirin.
*Helbest bi her zaravayê kurdî dibe.
*Helbestkar dikarin herî kêm bi 3, herî zêde bi 5 helbestan beşdarî pêşbirkê bibin.
"*Navnîşana mîhrîcanê: @menalfestival
*Jimare ji bo danûstendina bi sekreter re:
0912 019 6025
0918 748 3257

## Fêrgeha Kurdî dest bi dayîna dersên Kurdî dike

Di vê serdemê de ku mirov ji ber koronavîrûsê ji mala xwe dernakevin, li ser înternetê ji bo hînkirina Kurdî, Fêrgeha Kurdî hatibû amadekirin. Vîdeoya pêşî a Fêrgeha Kurdî 13'ê Nîsanê hat weşandin.
Ji ber şewba Covîd-19'ê li beşeke zêde ya dinyayê mirovan xwe vekişandiye malên xwe. Ciwanên ku xwestine di vê serdemê de tiştekî baş bikin, bi navê Fêrgeha Kurdî xebatek dan destpêkirin.
Di vê çarçoveyê de ji bo kesên ku qet bi Kurdî nizanin û dixwazin Kurdiya xwe geş bikin wê vîdeoyên perwerdeyê werin belavkirin.
Bi saeta Amedê saet di 19'an de wê her Duşem, Çarşem û Înê vîdeoyên perwerdeyê werin weşandin.
Hat diyarkirin ku di demên pêş de wê li ser yoûtûbe û platformên medyaya civakî jî weşan were kirin.

## 'Rola huner û hunermendan di vê pêvajoya girîng û hesas de pir pîroz e'



Hevseroka Tevgera Çand û Hunerê ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Nesrîn Botan, derbarê rola çandê ya di nava civakê de û bandora wê li mirovên herêmê nirxandin kir û got; "Rola huner û hunermendan di vê pêvajoya girîng û hesas de pir pîroz e û hişyariyeke mezin dide civakê. Îro em hemû di ber civaka xwe de berpirsyar in."

Tevgera Çand û Hunerê di civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de di nava rewşên herî zehmet de xebata xwe her domand. Di rewşên şer û êrîşan de xwedî rolên pêşeng bû. Bi derxistina stiranên şoreşê hestên civakê her geş kirin.

Herwiha di nava vê rewşa heyî de jî a derketina nexweşiya Vîrûsa Koronayê, Tevgera Çandê dîsa bi hunerê xwe dilê mirovên civakê rehet dike û rewşeke dûrî tirsê dide avakirin. Têkildarî mijarê Hevseroka Tevgera Çand û Hunerê ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Nesrîn Botan, rola çandê ya di nava civakê de û bandora wê li ser mirovên herêmê nirxand.

**'ROLA HUNER Û HUNERMENDAN Dİ VÊ PÊVAJOYA GİRÎNG Û HESAS DE PİR PÎROZ E'**

Nesrîn di destpêka axaftina xwe de li ser rola Çand û Hunerê ya di nava civakê de axivî û wiha got: "Rola huner û hunermendan di vê pêvajoya girîng û hesas de pir pîroz e û hişyariyeke mezin dide civakê. Hunermend bi riya staranên xwe hestên xwe tînin ziman û bi nivîs, tablo, şanoyên xwe civakê hişyar dikin. Ji bo wê jî em dikarin bêjin ku heta asteke bilind civaka me li hestê hunermend guhdar e."

**'EM HEMÛ Dİ BER CİVAKA XWE DE BERPİRSİYAR İN'**

Nesrîn derbarê biryarên Rêveberiya Xweser ên ji bo nexweşiya Vîrûsa Koronayê nêrîna xwe anî ziman û wiha got: "Di nava rewşa heyî de û ji bo ev Vîrûsa Koronayê li herêma me dernekeve, biryarên Rêveberiya Xweser di cih de bûn. Em jî wek hunermend bi rêklamên piçûk, bi şanoyên ku gel baldar bikin tevlî vê pêvajoyê, bûn. Lewre ev ne erkê aliyekî tenê ye, îro em hemû di ber civaka xwe de berpirsiyar in. Gelê me jî li van biryaran xwedî derdikeve. Tevî rewşa heyî jî karê me yê hunerî ranewestiyaye. Lewre di zerfên mîna şer û êrîşan de em bi hunerê jiyan û bi gelê xwe jî dida jîyîn, di wê navê de rehetiyek di nava dilê wan de çêdibû. Civak û hunermend bi hev re girêdayî ne û baweriya gel bi hunermendan heye."

**'SÎSTEMÊN DESTHİLATDAR NAXWAZİN JİN Bİ ÇANDÊ RE BİJÎ'**

Nesrîn di dawiya axaftina xwe de destdirêjiya sîstemên serdest ya li ser çanda jinê nirxand û wiha pê de çû: "Ji dîrokê heta niha, dijminatî ji aliyê sîstemên desthilatdar ve ji çanda jin re tê kirin. Jin di nava kîjan beşa jiyanê de çalak be, dibe hedef. Bi taybetî çanda jinê ya ku her zindî maye bû hedef. Herî dawiyê jî li Bakurê Kurdistanê hin hunermend ji aliyê dewleta Tirk ve hatin girtin, di vê navberê de ji bo berdewamiya xeta têkoşîna jinê hunermend Hêlîn Bolek çalakiya grevê dest pê kir û di encamê de jiyana xwe ji dest da. Em dikarin bêjin sîstemên desthilatdar naxwazin jin bi çandê re bijî. Lewre eger çand zindî bibe ev civak jî rih pê tê û derdikeve pêş. Têkoşîna jinan ji bo çand û hunera xwe, kesayeta jina azad diafirîne."

# Komîteya Zimhêrê li Tirbespiyê madeyên demborî imha kirin

Di gera Komîteya Zimhêrê ya navçeya Tirbespiyê ya li ser dikanên bazirganiyê de madeyên demborî hatin girtin û bi amadebûna endamên meclisa navçeyê û Serdozgeriya Giştî hatin imhakirin.



Komîteya Zimhêrê ya Herêma Cizîrê gerên xwe li ser dikanên ku qedexeya derketinê li ser wan nîne, zêde kirin. Herwiha di gera li navçeya Tirbesiyê de madeyên xwarin û kozmetîkê yên demborî hatin girtin.
Ev made hatin desteserkirin û bi amadebûna endamên meclisa navçeya Tirbespiyê, Serdozgeriya Giştî û Komîteya Aborî hatin imhakirin.
Endamê rêveber ê Komîteya Zimhêrê Xalid Ebdulqadir Xelef diyar kir ku komîte gerên ji bo disîplînkirina biha û desteserkirina madeyên demborî didomîne.

## Komîteya Zimhêrê ya Dirbêsiyê madeyên demborî telef kirin

Komîteyta Zimhêrê ya navçeya Dirbêsiyê miqdareke madeyên demborî telef kirin.
Komîteya Zimhêrê ya naçeya Dirbêsiyê ya kantona Hesekê, bi awayekî birêkûpêk li ser dikan û sûkên navçeyê digere. Komîteyê berî du rojan miqdareke madeyên demborî girtin û li cihê gelêşê (avêtina çopê) li gundê Berkevirê şewitandin.
Madeyên demborî ji vexwarinên gazê û hin madeyên xwarinê pêk dihatin.
Yek ji rêveberên Komîteya Zimhêrê Husên Elo diyar ku di



gera xwe ya li sûka navçeyê de, ev made girtine û da xuyakirin ku rojane li sûkan digerin da pêşî li keysbaziya madeyan, bilindkirina bihaa û firotina madeyên demborî bigirin û tenduristiya welatiyan biparêzin.

## Werşeya Amargî li Kobanê ji bo parastina ji Koronavîrûsê maskeyan çêdike

Werşeya Amargî ya girêdayî Kongreya Star li Kobanê dest bi çêkirina maskeyan kir
Li cîhanê Koronavîrûs bi lez belav bû û piştî qeydkirina bi hezaran a rewşên mirin û pêketinê, vegeriya pandemiya cîhanî.
Ji bo pêşîgirtina li belavbûna Koronavîrûsê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Rêveberiya Xweser gelek tedbîr girtin. Yek ji wan biryara qedexeya derketina derve ya 23'yê Adarê ye.
Piraniyan werşeyên (atolye) dirûtina cilan vegeriyan ciyên dirûtina maskeyan.
Li bajarê Kobanê Werşeya Amargî ya girêdayî Kongreya Star çend roj in dest bi çêkirina maskeyan kiriye û bêpere li welatiyan belav dike. Di werşeyê de 10 karker dixebitin û rojane nêzî 100 maskan çêdikin.
Derheqê vê însiyatîfê de, endama Koordînasyona Kongreya Star a herêma Firatê Rewşen Hacim wiha got: "Piştî belavbûna Koronavîrûsê li cîhanê, me dest bi çêkirina maskeyan kir."
Rewşen diyar kir ku wê li ser du beşan maske bên belavkirin, beşek ji bo saziyên Rêveberiya




Xweser, beşa din li welatiyan bi riya komînan bê pere bên belavkirin.
Rewşen Hacim gor, eger pêwîstî bi maskeyan çêbû emê werşeyeke din jî vekin.

## Li navçeya Şedadê ceribandina çandina kemûnê

Komek cotkarên gundewarên başûrê bajarê Hesekê cara yekê kemûn çandin. Erdê kêmên lê hatî çandin bi sedan donim e. Şêniyên gundewarên başûrê kantona Hesekê debara xwe bi çandina genim, ce û pembû dikin. Lê ji ber rewşa dawiyê nêzî 10 salan e şêniyên herêmê pembû naçînin.
Îsal ji bo tecrûbe cotkaran bi desteka Komîteya Çandiniyê ya navçeya Şedadê zeviyên xwe kirin kemûn.
Cotkaran destpêkê serdana navçeyên bakurê kantonên Hesekê û Qamişlo mîna Dirbêsiyê, Amûde û Til Temirê kir da awayên çandina wê û eleqedariya pêwîst binasin.
Cotkarê bi navê Husam El-Ezîz ji şêniyên navçeya Şedadê ye diyar kir ku kemûn wek tecrûbeya yekê çandiye.
Li herêmên başûrê kantona Hesekê berî 20 salan kuncî, fistiq, sebze bi tevayiya cureyan, pembû û berberû û whd dihatin çandin. Lê qutkirina ava Xabûr bandor li çandiniya herêmê kir.



## Cîhan diguhere, dewşirme naguherin



Medeni FERHO

Em di destpêka klîmatên îdeolojiyeke nû de ne…
Ji aliyekî ve lîdertiya Emerîka ya cîhana kapîtalîst têk diçe, ji aliyê din ve yekîtiya demokrasiya lîberal, Ewropa diheje.
Vîrûsa korona, êrîşên kordîne (!) didomîne û maskeya siyaseta durû rakir, cîhan, mecbûrî maskeya parastina ji xwe kir. Piştî rakirina maskeya durûtiya siyasî, faşîzma dewşirme jî, ji alî ve eşkere bû.
Rojnamevan û nivîskarên Kurd, li ser faşîzma dewşirme, newî dîktatoriya Fuhrer- Reîs radiwestin.
Kampanya "em têra xwe dikin", ya parsekiya 10 lîreyên Tirkî, bi pêşengiya Reîs Erdogan jî, kiryarên partiyên faşîst yên Elmanya û Îtalya û slogana "em têra xwe dikin" ya destpêka Faşîzma Fuhrer û Dûçe, anî bîra her kesî.
Dîrokzanê Elmanî Jurkan Kocka, ji bo naziyan dibêje: "Faşîzm, ne li ser bingeha kapîtalîzma îro, li ser bingeha kevneşopiya feodalîteya bêyom bi ser ket û bû desthilatdar". Edî eşkere bûye ku faşîzma dewşirme, li ser kevneşopiya Îttîhadiyên bêyom gihatiye îro.
Mixabin, îroniya lêkolîner û dîrokzanan, ligel hişmendiya neolîberal bû sedema ku heta îro faşîzma dewşirme, veşartî bimîne. Dîmîtrov jî, faşîzma her welatî cuda dinirxîne. Kesî jî, faşîzma dewşirme di çarçoveya Antolya û Kurdistanê de lêkolîn nekiriye. El heq, dîrokzan û lêkolînerên Tirk jî dewşirme ne, lêkolîner û dîrokzanên Kurd jî, piştî Hereketa Azadiya Kurd derketin holê, hû balix nebûne.
Di nava Kurdan de yek dîrokzan û yek lêkolînerê ku, rastiya dîrokî, faşîzm û dînazoriya sîstema kapîtalîst bi têrayî nivîsiye, eşkere kiriye Abdullah Ocalan e.
Di van rojên dawî de, faşîzma dewşirme, ji gelek aliyan ve di rojeva nivîskar û rojnamevanên Kurd de ye. Edî, mîna lêkolînên "holocaust", li ser sîstema dewşirme, kesayet û îdeolojiya dewşirme radiwestin û didin xuyakirin ku mîna "faşîzma holocaust", "faşîzma qirkirina Kurdan" heye. Divê Kurd û Tirk, faşîzma dewşirme ji her alî ve lêkolîn bikin.
Ne Gramsci, ne Clara Zetkîn, faşîzma dewşirme dîtine. Thalheimer, faşîzm û bonapartîzmê nêzîkî hev dike. Ev nirxandin dikare ji bo faşîzma dewşirme bibê mînak, lê kêm dimîne. Daniel Guerin jî, faşîzmê wek amûrê rastmaliya mezin bi nav dike. Abdullah Ocalan, her du nirxandin girtine dest û gavekê wêdetir avêtiye, wek di romana Suç û Ceza ya Dostoyesvkî û di Weba John Paul Sartre
De tê dîtin, sîstemê û tahrîbatên dike, di aliyê felsefî, psîkolojî û pedegojîk de, bi kiryarên polîsiye, leşkerî û aborî dixemilîne û analîz dike.
Lewma, di aliyê pedagojîk de, wek mamostayekî ku bedena kesayeta Kurd ji "evîndariya kujerên xwe" paqij bike tevdigere.
Ocalan û Daniel Guerîn, ku faşîzm, bi armanca berterefkirina muxlafetê, komên çete, bi gotina D. Guerin "plebyen-çete-cerdevan" ava dike de, digihin hev.
Ev kultura lîncê ye, êrîşkerên nijadperest, sergerdeyên kolanan mobilîze dike û êrîşan dike.
Eger lêkolînek ciddî bê kirin, wê were dîtin ku; îdeolojiya faşîzma dewşirme, doh bi kiryarên dehşetengîz Enwerîzm-Enwerland bû, îro jî bi kiryarên dehşetengîz Erdoganîzm-Erdoganland e.
Di dema qirkirina Ermenî Suryanî-Keldanî-Asuriyan de, Îttîhadiyên Selanîkî, komên çete, Çerkez, El Xemsîn, Taburên Kasaban, Çeteyên Neco û hwd. Ava kirin. Ev çete ji bo Fuhrer bûne mînak. Niha jî Reîs Erdogan, ligel çeteyên hançer, cerdevan, 37 komên çete avakirine. Ne tenê Kurd, gelê Libya, Srîlanka, ji ber çeteyên faşîzma dewşirme dikine hawar.
Nivîskarê Emerîkanî Daniel Goldhagen, di pûrtûka "Celladên Dilsoz Yên Hîtler" de, "holocaust"ê weke projeya gelê Elman bi nav dike. Dewşirmeyên ku dibin navê Turk-î Îslamê de, gelê Tirk jî din av de, "qirkirina gelan" dikin, xwedî projeyek wisa ne.
Di encamê de, vîrûsa korona, sîstema kapîtalîst, dewlet-netewe hejandine û ber bi klîmatên îdeoljiyên nû ve daf dane. Dibêjin, êdî cîhan wek berê namîne. Ev gotin "tobe Nesuh" e û dibe ku cîhan biguhere, lê qet û lilleh faşîzma dewşirme nayê guhertin, wê kirasekî li gorî demê qaz bike li xwe bike.
Faşîzma dewşirme, kevir e, kevir bê exlaq e, nikare karakterê xwe biguherîne. Cîhan li aliyekî ye, faşîzma dewşirme lê aliyekî ye.
Li hemberî bangên Neteweyên Yekbûyî, rayedarên cîhanê, zanist û akademîsyenên cîhanê, saziyên mafê mirovan, ku navên Tirkiyê dikirînin û banga berdana girtiyan dikin, banga rawestandina nîjadperestiya hişk, ya kotikwarî dikin, "celladên Erdogan", di çarçoveya projeya startejîk ya tunekirina Kurdan de, êrîşên xwe didomînin.
Lê Fuhrer-Reîs Erdogan, kampanya "em têra xwe dikin" daye destpêkirin, komên xelkê û aboriya welat milîtarîze dike. Bi qanûna infazê jî, hiquqê dijimnatiya li dijî kurdan meşrû dike.
Hevalên Dostoyewskîç, ji sedema hassasiyet û hêrsa Dostoyevskî, navê "Agir Fedya" lê kiribûn.
Lê Agir Fedya, di romanên xwe de, serdemên herî tarî, kiryarên bêaxlakî yên Rusya di romanên xwe de nivîsîne.
Divê nivîskarên Kurd jî bibin agir, weke ava li ser agir, bifûrin.



# Kongreya Star dayîka Ûweyş bîr anî

Koordînasyona Kongreya Star – Rojava dayîka Rêber Abdullah Ocalan, Ûweyş di salvegera wefata wê ya 27'an de bîr anî û got, "Dayîka Ûweyş wê weke nimûneya lehengî û serfiraziyê bimîne, bi saya wê riya me ya ber bi azadiyê ve ronî bû."



Koordînasyona Kongreya Star – Rojava bi pêmana salvagera 27'an a wefata dayîka Rêber Abdullah Ocalan, Ûweyş daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Daxuyanî wiha ye;
"Dayîka Ûweyş mînaka jina azad a berxwedêr e, ku li hemberî şert û mercên jiyanê yên zehmet û astengiyên mezin ên di her aliyê jiyana malbatî, civakî û aborî de sekinî, teslîm nebû û zarokên xwe li ser giyanê berxwedanê mezin kirin.
Dayîka Ûweyş mîna dibistanekê bû, jiyana wê bi gelek mînakan, wekî sebir, tolhildan, redkirina teslîmbûnê, jiyana birûmet û azadîxwaziyê tijî bû. Ev taybetmendî zemîna avakirina kesayeteke fermandar û leheng mîna Rêber Abdullah Ocalan danî, yê ku ji zarokatiya xwe ve dest bi têkoşînê kir. Dayîka Ûweyş tevî ku xwendin û nivîsandin nedizanî, helwesta wê di jiyanê de, mîna îrade û israra li hemberî jiyanê hebû.
Dayîka Ûweyş nişan da ku azadî ji zarokatiyê ve dest pê dike, ev di perwerdekirina durist a Rêbertî û piştgiriya wî de diyar bû.
Serkeftinên mezin ên ku gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi taybetî serkeftinên jinê, avakirina neteweya demokratîk keda Rêbertiyê ne. Rêbertiyê li hemberî xeta şofenîst, netewperest û sîstema kapîtalîst, neteweya demokratik da avakirin.
Di dawiyê de em dibêjin ku dayîka Ûweyş wê mînaka lehengî û serfiraziyê bimîne.
Lewre bi saya wê riya me ya ber bi azadiyê ve ronî bû.
Dayîka Ûweyş rêberê mezin xwedî kir, em bi saya wî azad dijîn."

## Jinên Ciwan ên Têkoşer: Jin xwe neparêzin ti kes wan naparêze

"Bangawaziya me ew e ku jin û jinên ciwan li hemberî feraseta jinkuj û destdirêjî rêxistina xwe mezin bikin. Xwe birêxistin bikin. Li hemberî êrîşan xwe biparêzin. Eger em xwe neparêzin ti kes me naparêze."
Vîrûsa koronayê (Covîd-19) û karantînakirina jinan di malan de, bûne sedem ku şidet û destdirêjiya li jinan zêde bibe.
Li Iraq û Başûrê Kurdistanê ev rêje zêdetir e. Tê gotin kesên di vê demê de jin kuştine û dest avêtine jinan hatine efûkirin û li nava civakê digerin.
Destdirêjiya li keça 7 salî ya li Hewlêrê û destdirêjiya li jineke kêmendam a li navçeya Pirdê ya Kerkûkê çend mînakên şideta li ser jinê ne.
Rêxistina Jinan ên Ciwan ên Têkoşer têkildarî mijarê daxuya-




niyek weşand.
Rêxistinê ev bûyer û êrîş bi dijwarî şermezar kirin.
Di daxuyaniyê de wiha hat gotin, "Emê li hemberî feraset û aqilê jinkuj û destdirêjiyan têkoşîna xwe mezin bikin. Di vê tekoşînê de emê ti caran ranewestin û nesekinin. Bangawaziya me ew e ku jin û jinên ciwan li hemberî feraseta jinkuj û destdirêjiyê rêxistina xwe mezin bikin. Xwe birêxistin bikin. Li hemberî êrîşan xwe biparêzin. Eger em xwe neparêzin ti kes me naparêze."

## Di karantînayê de şideta li jinê ji sedî 27.8 zêde bû




Navenda Lêkolînên Qada Polîtîk a Civakî ragihand, di pêvajoya karantînayê de şideta li jinê ji sedî 27.8 zêde bûye.
Navenda Lêkolîna Qada Polîtîk a Civakî ya Tirkiyê piştî vîrûs belav bû û pêvajoya karantinayê dest pê kir, di navbera 3 û 8'ê Nîsanê de li 28 bajaran lêkolîna qadê kir. Li gorî lêkolînê şideta di nava malê de ji sedî 27.8 zêde bûye. Li gorî lêkolînê şideta li ser zarokan jî ji sedî 19 zêde bûye. tl û 3 hezar tl de ye.
Li gorî lêkolîna anketê piştî vîrûsê ji sedi 34.8 kesan karbeşiya nava malê kirin û ji sedî 33.1 nîvî bi nîv û ji sedî 32.1 jî karbeşiya karê nava male nekirine.
Piştî karantinayê rageşî û niqaşên nava malê zêde bû. Li gorî lêkolînê ji sedî 69.4'an diyar kirin ku piştî karantînayê niqaşa nava malê zêde bû. Ji sedî 30.6 kesan jî diyar kir ku şidet pêş neket.

**TUNDIYA ZILAM LI PÊŞ E**

Li gorî lêkolînê piştî karantinayê şideta di nava malê ya ji sedî 23.7 şideta derûnî, ji sedî 10.3 şideta aborî, ji sedî 4.3 şideta dijştal, ji sedi 1.7' şideta fizîki û ji sedî 1.4 şideta zayendî pêş ket. Ji sedî 32 kesên diyar kirîn ku zor li wan hatiye kirin, dan xuyakirin ku rastî şideta hemserê xwe hatine. Ji sedî 15.4 rastî şideta bav, ji sedî 14.8 rastî şideta birayê xwe hatine.

## Di pêvajoya pandemiyê de şidet zêde bû: Dewleta Tirk jinan nabîne

Jinan diyar kir ku bi pêvajoya vîrûsê re bangên 'li malê bimînin' tên kirin û ji ber vê şidet û kuştina jinan jî zêde bûne û gotin, "Dewleta Tirk nikare jinan ji nedîtîve bê."

Piştî vîrûsa korona li seranserê cîhanê belav bû, şideta li ser jinan jî zêde bû. Li Tirkiyê di 20 rojên ewil yên vîrûsê de 21 jin hatin kuştin. Federasyona Komeleyên Jinan a Tirkiyê (TKDF) diyar kir ku gelek jinan serî li Xeta Lezgîn xistiye û gelek saziyên jinan jî diyar dikin ku jimara jinên rastî şidetê hatîn zêde bûye.

Bi bangên 'li malê bin' re şideta mêra a li ser jinan zêde bû. Jinan bertek nîşanî rewşê da û diyar kirin ku hikûmetê ti tedbîr negirine.

**'XİZMET NİHA BİSÎNOR BÛYE'**

Ji Weqfa Piştgiriya Jinan Nîhan Darmarli diyar kir ku di pêvajoya karantînayê de jimara jinên hatîn kuştin nîşan dide ku ewleyiya jinan li malê nîne û got, "Jin herî zêde ji aliyê mêrên nêzî wan ve hatine kuştin. Ji bo parastina ji vîrûsê cihên herî ewle mal tên nîşandan. Lê mixabin jin û zarok bi mêrên ku şidet û îstîsmarê dikin re ligel hev in. Eşkere ye ku di vê rewşê de wê şidet zêde bibe. Mekanîzmayên têkoşîna li dijî şidetê jî niha bi sînortir xizmetê dikin."

**'JİN Dİ PÊVAJOYA PANDEMİYÊ DE DİKARİN TEREDÛT BİKİN'**

Nîhanê wiha got: "Li Tirkiyê xeteke lezgîn ya ji bo jinan tenê hatî veqetandin nîne. Di vê pêvajoyê de gelek kes ji ber





daxwaziyên cuda serî li xetên 155 polîs îmdat, 183 Xeta Piştgiriya Civakî, 112 Lezgîn, 156 Cenderme digerin. Ji ber vê jî jin zehmetiyê dikşînin xwe bigihînin xetan û dikevin teredûtê. Li gelek welatan rayedaran diyar kir ku şideta li ser jinê zêde bûye. Ji bo vê tedbîr hatin girtin û butçe hatin veqetandin. Niha sererastkitina înfazê ya ku gumanbarên şîdetê ji girtîgeha derdixin anîn Meclîsê. Ev jî wê şîdeta li ser jinan zêdetir bike. Di vê pêvajoyê de em bi telefon û e-maîlan bi jinan re têkiliyê datînin. Bi sererastkirina înfazê re gelek jin li me geriyan û gotin kî ji vê qanûnê fêdeyê digire."

**'PİŞTÎ PANDEMİYÊ WÊ TABLOYEK CİDÎ DERKEVE HOLÊ'**

Seroka Navenda Mafê Jinan a Baroya Enqereyê Îdîl Yalçiner, jî da xuyakirin ku piştî pandemiyê wê derbarê şîdet û kuştina jinan de tabloyek cidî derkeve holê û wiha got: "Di vê pêvajoyê de rojev bûye vîrûs. Şîdet û kuştina jinan cih nagire. Her çiqas di çapemeniyê de neyê dîtin jî van rojan kuştina jinan zêde bûye. Di pêvajoya pandemî de xetên 112, 155 û 183 naxebitin. Lê em wek Baroya Enqereyê di vê pêvajoyê de jinan tenê nahêlin.

**'JİN Lİ MALÊ TENÊ HATİN HİŞTİN'**

Îdîlê di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser tedbîrên li dijî şîdeta li ser jinan û got, "Di vê pêvajoyê de divê dewlet tedbîran bigire û di vê mijarê de berpirsyar e. Lê mixabin di vê pêvajoyê de jin li malê tenê hatin hiştin. Bi destê dewletê tenê hatin hiştin.

**'BİLA JİN XWE BİGİHÎNİN ME'**

Ji Meclîsa Jinan a HDP'ê Turkan Demîr jî diyar kir ku divê jin dengê xwen bilind bikin û got ji bo vê jî di pêvajoyê de çapemeniya civakî zêdetir û bibandortir bi kar tînin. Turkanê da xuyakirin ku di meha Adarê de 18 jê li malê bi giştî 29 jin hatine kuştin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Bi pandemiyê re ewleyiya canê jinan li malê nema. Niha dixwazin bi qanûna înfazê re, gumanbarên sûcên li dijî jin û zarokan pêk anîne bên berdan. Em dibînin ku di vê pêvajoyê de jin rastî her cureyê şîdetê tên. Em bang dikin ku jinên rastî şîdetê tên xwe bigihînin me."

# KCK: Divê derbarê tenduristiya rêber Ocalan de agahî were girtin

KCK'ê bi daxuyaniyekê bal kişand ser rewşa rêber Abdullah Ocalan ku di dema pandemiya Koronavîrûsê (Covid-19) de agahî jê nayên girtin û wiha diyar kir: "Niha têkildarî tenduristî û ewleyiya Rêberê Gelê Kurd ti agahî nayên girtin. Di dema koronavîrûsê de mafê herî xwazayî ye ku malbat û parêzer derheqê tenduristî û ewleyiyê de agahiyê bistînin."

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê têkildarî mijarê daxuyaniyeke nivîskî weşand û wiha da zanîn: ''Vîrûsa koronayê ku li seranserê cîhanê belav bûye, li Kurdistan û Tirkiyê di demeke kurt de belav bûye. Hatiye dîtin ku ev vîrûs li deverên sar û hêwî û li bajarên mezin pirtir belav dibe. Herwiha deverên ku mirov bi hev re lê dijîn, bi hev re lê dixebitin û çalakî tên kirin vîrûs bi leztir belav dibe. Ji ber wê tê gotin li girtîgehan rîska belavbûna vîrûsê zêdetir e. Jixwe ji ber vê sedemê saziyên mafên mirovan ku li cîhanê kar dikin, bang dikin ku di serî de girtiyên siyasî, girtî tev werin berdan. Ji ber vîrûsê tê xwestin ku girtiyên li Kurdistan û Tirkiyê û yên cezaxwarî werin berdan.




Dema vîrûsa koronayê li girtîgehên Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê serdanên malbatan hatiye qedexekirin, axaftinên bi telefonan jî heftane bûne du car. Lê Rêberê Gelê Kurd li Îmraliyê ne dikare malbat û parêzerên xwe bibîne û li gel ku hatiye xwestin jî ne dikare bi malbat û parêzerên xwe re bi telefonê biaxive. Niha derbarê tenduristî û ewleyiya Rêberê Gelê Kurd de ti agahî nayên standin. Dema vîrûsa koronayê mafê herî sirûştî ye ku malbat, parêzer derheqê tenduristî û ewleyiyê de agahiyê bistînin. Ji vî alî ve pir girîng e ku derbarê tenduristiya Rêberê Gelê Kurd de agahî were standin. Gelê me dixwaze derheqê tenduristî û ewleyiya wî de agahiyê bistîne.

Di roja me ya îro de ku mirovayî tev di nava şokê de ye, ji her demê pirtir pêwîstiya civakê bi proje û pêşniyarên rêber Apo yên li ser pirsgirkên rûdidin, heye. Di vî warî de tenduristî, ewleyî û mercên azad ên xebatê yên rêber Apo di serî de ji bo gelên Tirkiye û Rojhilata Navî ji bo ji tevayiya mirovayiyê re xizmetê bike, erkê gelê me û mirovahiyê ye têkoşînê bike.

Divê gelê Kurd li gel hêzên demokratîk ên Tirkiyê û Rojhilata Navî dîsa raya giştî ya cîhanê di mijara tenduristî û ewleyiya rêber Apo de tim di nava têkoşînê de be, divê bilez agahiyek ji rêber Apo bê girtin."

## Riya xwe ji pergala bêyom xelaskirinê



QASIM ENGÎN

Malûm e Vîrûsa Korona pergala kapîtalîst serûbin kir. Derket holê ku ew pergala ku xwe bêhempa didît û heta xwe wek pergala Dawî ya Dîrokê bi nav kirîbû, hildeweşe.

DYA Împaratorê vê cîhanê û Ewropa jî vasalê xwe yê vê împaratoriyê bûn. Lê derket holê digel ku tevayiya cîhanê ji bo bikare zikê DYA û Ewropa têr bike kar dike, îro DYA û Ewropa dest û lîngên xwe bi hev re dialin. Li hemberî nexweşiyekê -çendî ev nexweşî wan bi zanabûn derxistiye hê ne diyar jî bibe- bêçare ne. Pergala ku qaşo Dawiya Dîrokê dianî îro li ber lêpirsînê ye. Cîhan li hemberî vê pergalê bêbawer dibin û li riyên din ji xwe re digerin.

Pir balkêş e ku, ev pergala bi navê kapîtalîst herî zêde ferdparêzî da pêş. Teşvîk dikir ku herkes xwe xelas bike. Heta kesên ku hewl dan hevkariyê, alîkariyê, parevekirinê pêş bixin wek ehmeq bi nav dikirin û teşhîra mirovên wisa dikir. Bi gotina bav û kalan; "Dixwim nan û avê, min mineta kesî navê." Bi gotineke din, ev pergala bêyom kesekî tenê xwe bi felsefa takekesî ango ferdparêzî pêş xist. Ev ferdparêzî ewqas pêş xistin ku, ji bo kesên wiha mirovayî ne tiştek e lê ew bi xwe bûn her tişt.

Di keleka vê de bi endustriyalîzmê ango pîşesazîtî ji bo ku bikaribin hinek dîtir pere qezenç bikin bi tevahiya jingeh ango derdor ma leîstin. Destverdana li ser DNA yên organizman kirin û bi genetîkên wan lîstin.

Di qada siyasî de jî netewperestiya ku xwe dispêre dewlet-neteweyan afirandin. Li navendekê de xwestin mîlyonan mirovan bi rê ve bibin. Hêza xwe bi xwe rêvebirinê, hêza prensîba têra xwekirinê, kuştin. Mirov bêhêz û bêçare hiştin.

Di encam de derket holê ku ev pergala ku xwe dispêrê tenê qezenca li ser şelandina mirovan, ferdparêziya ku tenê xwe difikre, dewlet-neteweya ku hineka esas digire û yên din dike obje, pîşêsazîtiya ku ekoloji ji bo berîka hênakan tijî bike hildewşîne cîhanek ku em êdî tê de nikarin bijîn afirandin.

Pir vekirî ye ku kapîtalîzmê îflas kiriye. Kapîtalîzm xwezeya xwe pêxirtengî ango bûhran e. Lê em dizanin ku kesên diz ango kapîtalîst di kûrayiya dîrokê de her tim di rewşên wiha de ji xwe re riyên nû ango tûpên oksîjenê ji bo bikarin li ser piyan bimînin peyda kirine.

Yek ji wan riyan her tim bi kesên weke Hîtler, Musolînî, Salazar, Franko, Pînochet û hwd ango Dîktatoran hêzên kapîtalîst berjewendiyên xwe parastine.

Riyeke din jî careke din destavêtine xapandina û mirovahî bi teknolojiyên nû di xew de hiştine. Emê bibînin ka vê carê hêzên kapîtalîst ê di tûrikên xwe de bi kijan rêbaza cambazan kewroşkê derxin.

Kapîtalîst çi bikin bila bikin derket holê ku kapîtalîzma li ser qezenca şexs îflas kiriye. Bi pîşesazîtiyê bêyom cîhana me hildeweşîne. Bi netewperestî ango dewlet-netewe jî mirovayiyê ji hev dûr dixe, mirovan nexweş û bêxêr dike. Bi gotineke din, êdî fikrandineke nû ya alternatîf pêwîst e. Ev alternatîf jî hîç guman nîne ku; civakeke demokratîk, ekolojik û bi azadîxwaziya jinê re mûmkin e.

Ango:

Bi civakeke demokratîk li ser esasê Konfederalîzma Demokratîk a ku bi rêbaza Xweseriya Demokratîk rê ve dike ku her reng, her netewe, her bawerî bi avayiyên piçûk bikarin bi hêşmendiya alîkarî, hevkarî, parevekirinê xwe bi rê ve bibin.

Bi pîşesazîtiya ku derdor diparêze û tenê bi prensîba pêdîviyên civakê kar dike.

Li ser azadîxwaziya jinê jî di nava mirovan de wekheviyê, edaletê pêş dixe û bi rêbaza Nomos ango aboriya malê ku têra herkesî bike jî bi rê ve dibe.

Riya xwe ji pergala bêyom xelaskirinê tam jî ev e!

## MSD: Em bi hêvî ne Paskalya bibe sedema aştî û tenduristiyê

MSD`ê bi daxuyaniyekê cejna Paskalya li gelên xiristiyan ên li Sûriyê û cîhanê pîroz kir û hêvî kir ku ev cejin bi xwe re tenduristiyê ji tevayiya mirovayiyê re bîne û diyar kir ku aştî bê bexşandin û qebûlkirina hev pêk nayê.

Bi pêmana cejna Paskalyayê dikeve 12`ê Nîsanê, Meclisa Sûriya Demokraîtk (MSD) daxuyaniyeke nivîskî parve kir. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin:

"Em îsal cejna Paskalyayê ji ber belavbûna Koronavîrûsê li cîhanê, di şertên zehmet de pêşwazî dikin. Ji ber wê divê em li gorî perspektîfên tenduristiyê tev bigerin û şahiyên giştî li dar nexin. Wek MSD em cejna Paskalyayê li tevayiya gelê xiristiyan ên li Sûriyê û cîhanê pîroz dikin û hêvî dikin ku bi xwe re tenduristî û saxiyê ji mirovayiyê re bîne.

Em careke din diyar dikin ku aştî bê bexşandin û qebûlkirina hev pêk nayê. Divê em welatekî ku ferq û cudayiyê naxe navbera netewe, ol û mezheban ava bikin.

Careke din em cejna Paskalya li xiristiyanên Sûriyê û cîhanê pîroz dikin û hêvî dikin ku em şahî û cejnên xwe di şert û mercên xweştir de, pêşwazî bikin ku li Sûriyê edalet û wekhevî bi saya sîstemeke nenavendî û demokratîk pêk bê."

## TEV-DEM: Rewşa rêber Abdullah Ocalan û girtiyên siyasî cihê fikaran e

Tevgera Civaka Demokratîk îşaret pê kir ku rewşa tenduristiyê ya rêber Abdullah Ocalan piştî hat eşkerekirin ku hin kes di girtîgehên delweta Tirk de bi Koronavîrûsê ketine û hin jî mirine, cihê fikaran e. TEV-DEM`ê bal kişand ku dewleta Tirk pîvanên navneteweyî binpê dike û ev jî isbata hovîtiya faşîstan dike. Ji ber wû em bang li rêxistinên mirovî û hiqûqqî dikin ku berê xwe bidin rewşa girtîgehên li Tirkiyê.

Roja Dueşemê Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) bi daxuyaniyekê ji raya giştî re kiryarên dewleta Tirk ên li dijî girtiyên siyasî, nexasim rêber Abdullah Ocalan eşkere kir û ragihand ku Koronavîrûs (Covid-19) di girtîgehên dewleta Tirk de belav bûye û rewşa rêber Abdullah Ocalan cihê fikarê ye.

Daxuyanî wiha ye:

"Di demeke wiha de ku Koronavîrûs li seranserê cîhanê berbelav bûye, tedbîrên pêwîst hem ji bo civakê hem jî ji bo kampan û girtîgehan tên girtin, herwiha gelek dewletan hin dosya di ber çavan re derbas kirin, ji wan dosyayan yek jî ya girtiyên siyasî ye û girtî berdan, yan jî karantîna ji wan re veqetandin û rê dan serdana parêzeran û malbatan.

Li ser vî esasî piştî ku jimara kesên di girtîgehên dewleta Tirk de yên ku bi vîrûsê ketine yan mirine hat eşkerekirin, rewşa rêber Abdullah Ocalan fikaran ji mirov re çêdike û hê zêdetir gumanên me têkildarî ku dewleta Tirk a şovenîst hovtirîn kiryaran li dijî girtiyên siyasî, nexasim li dijî rêber Ocalan dide meşandin.



TEV-DEM`ê di dawiya daxuyaniyê de bang li rêxistinên mirovî û mafnas kir ku rewşa girtiyên di girtîgehên dewleta Tirk de di ber çavan re derbas bikin û li beramberî kiryarên dewleta Tirk ên şovenîst ji grava Îmraliyê û girtiyên siyasî re bi berpirsyariya xwe rabin.



# Malbatên Şehîdan: Şandina cenazeyê şehîd Egîd bi pakêtekê derveyî exlaq e

Meclisa Malbatên Şehîdan a Herêma Cizîrê diyar kir ku şandina cenazeyê şehîd Egîd Îpek bi riya pakêtekê ji hêla dewleta Tirk ve kiryareke derexleqî ye.

Hikumeta Tirk cenazeyê şervanê HPG`ê Egîd Îpek piştî 3 salan bi pakêtekê ji malbatê re şand. Şehîd Egîd Îpek 2017`an li bajarê Dêrsim ê Bakurê Kurdistanê şehîd bûbû.

Meclisa Malbatên Şehîdan a Herêma Cizîrê têkildarî mijarê de daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin:

"Di vê demê de ku cîhan tev li hemberî Koronavîrûsê têkoşînê dike, dewleta Tirk a dagîrker bi her şêwazê hovane dijminiya gelê Kurd dike. Dewleta Tirk hewl dide bi riya çeteyên xwe yên nexweş vîrûsê li Bakurê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav bike.

Dewleta Tirk derheqê şervanekî HPG`ê de cûcekî hovane kir, cenaze parçe parçe kir û bi pakêtekê ji malbata wî re şand. Dewleta Tirk a dagîrker û çeteyên wê kuştin, talankirin, lîstina bi cenazeyan li Serê Kaniyê, Efrîn û Girê Spî didomîne û ev ne tişteke nû ye. Dewleta Tirk cenazeyê şehîd Egîd Îpek ku ji bajarê Amedê ye bi pakêtekê ji malbata wî re şand û ev dûrî exlaq û mirovayiyê ye, herwiha ne li gorî zangonên navneteweyî ye.

Em Meclisa Malbatên Şehîdan nikarin vê bûyera biêş û sûcê hovane ji bîr bikin. Şandina cenazeyê şehîd bi vî awayî tê wateya ku hebûna gelê Kurd inkar dike. Em soz didin şehîd Egîd û dayikên şehîdan ku emê asta têkoşîn û fedakariyê bilind bikin da hesab ji sûcdarên şer, di serî de Erdogan û çeteyên wî bixwazin."

## Ji bo kesên ji Şamê vedigerin test tên çêkirin



Kesên ji Şamê vedigerin Qamişlo ku di navendên taybet de ne, rojane test ji wan re tên çêkirin da selametiya wan ji Koronavîrûsê piştrast bibe û vîrûs li herêmê dernekeve.

Tîmên awarte yên girêdayî Şaneya Aloziyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê rojane testan ji kesên ji Şamê vedigerin re çêdikin ku selametiya wan piştrast bikin. Herwiha tedbîrên pêwîst tên girtin heta ku dema karantînayê bi dawî bibe.

Ji 23`yê Adara derbasbûyî ve qedexeya derketina derve li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dewam dike. Rêveberiya Xweser herwia gelek tedbîrên pêwîst girtin. Lêbelê hişmendiya hikumeta Sûriyê û domandina rêwîtiya bi balafiran ya di navbera Şam û Qamişlo de rewş bixetertir kir. Bê agahdarkirina Rêveberiya Xweser, di hefteyekê de bi behaneya ku rêwî leşker in, ji Şamê 3 seferên bi balafirê hatin kirin. Lê diyar bû ku di nava wan de sivîl jî hebûne. Li ser vê rewşê Şaneya Aloziyê destwerdan kir û testên pêwîst çêkirin. Piştre wek tedbîreke awarte xistin navendeke karantînayê.

Hevserokê Desteya Tenduristiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê û endamê Şaneya Aloziyê Ciwan Mistafa têkildarî mijdarê wiha axivî: "Ji bo rêwiyên tên balafirgeha Qamişlo, em pirsgirêkeke cidî dibînin. Tevî qedexeya derketinê jî, rêwîtiya asîmanî tê kirin. Herwiha hin rêwî bi awayekî qaçax tên derbaskirin da rastî testên tenduristiyê û karantînayê neyên."

Ciwan Mistafa da xuyakirin ku têkildarî kesên tên herêmê û rastî testên tenduristiyê û karantînayê nayên, hevkariya di navbera wan, komîn û meclisan de dewam dike û wiha got: "Bi saya hevkarî û koordîneya di navbera Şaneya Aloziyê, komîn û meclisan de, me hin kes anîn û testên tenduristiyê ji wan re çêkirin û xistin cihên taybet."

Ciwan Mistafa diyar kir ku ji bo 65 kesên hatîn herêmê, Şaneya Aloziyê bi awayekî awarte navendek tevî pêwîstiyên wê, ji wan re amade kiriye.

## Li Kobanê 3 ciwanan alavên nefeskişandinê çêkirin



3 ciwanên ji Kobanê di hefteyekê de 2 alavên nefeskişandinê bi armanca alîkariya Desteya Tenduristiyê ji bo girtina tedbîrên li dijî Koronavîrûsê, çêkirin.

Ji ber belavbûna Koronavîrusê (Covid-19) û kêmbûna alavên nefeskişandina sinaî li cîhanê bi giştî, hin ciwanên ji bajarê Kobanê hewl dan çareseriyên alternatîf bibînin û bi derfetên xwe alavan çêkin.

Cengîn Yûsiv, Enwer Mustafa û Elî Muslim 2 nimûneyên cuda yên alavên nefeskişandina sinaî bi lêçûneke kêm çêkirin.

Cengîn Yûsiv diyar kir ku armanc ew e ku jimareke mezin ji alavan bê peydakirin, wekî tedbîrekê li dijî Koronavîûrsê ku bilez li seranserê cîhanê belav dibe.

Desteya Tenduristiyê ya Herêma Firatê her du nimûneyan diceribîne da nimûneyekê hilbijêre û bi kar bîne.

Cengîn Yûsiv da xuyakirin ku di hefteyekê de her du alav çêkirin û ji tecrûbeyên gelek welatan ên di vê derbarê de sûd girtin.

Desteya Tenduristiyê ya Herêma Firatê berî demekê navendek ji bo rewşên biguman ên Koronavîrûsê û 2 navendên karantînayê ji bo derketina rewşên vîrûsê, amade kiribûn.

Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê alavên nefeskişandina sinaî pir kêm in.

## Emê bi hev re û bi disiplînê bi ser bikevin



Zekî BEDRAN

Di ragihandina dinyayê tevê de rojeva sereke nexweşiya koronavîrûsê ye. Ev nexweşî çawa ku gefê li tenduristya mirovan dixwe, ji qada aborî heta qada rêveberiyê bandorê li her tiştî dike. Eşkere ye ku aboriya gelek welatan ketiye zorê. Welatên weke Tirkiyê ku tenduristiya mirovan ji wan re ne girîng e, ji bo girtina aboriyê li ser piyan, dikarin guhê xwe nedin tenduristiyê. Welatên weke Îranê yên ne demokratîk rastiyan nabêjin, dixebitin nexweşiyê veşêrin. Ji bo wê nexweşî bilez belav bû.

Rejimên otorîter yên weke Sûriyê jî di heman rewşê de ne. Di ser de Sûriyê şerekî giran û wêranî dît. Binesaziya wê hilwşiya. Di sîstema tenduristiyê de pirsgirêkên giran hene. Weke din welat bûye sê parçe. Beşa di binê dagîrkeriya Tirkiyê de jixwe dixwaze rêveberiya Sûriyê tine bibe. Ji ber wê derdekî wê ku bi Şamê re hevkariyê bike, yan tedbîrên hevbeş bigire nîne. Lêbelê rêveberiyên bakur û rojhilat yên Sûriyê dixwazin pirsgirêkên xwe bi Şamê re çareser bikin û ji diyalogê re vekirî ne. Ji ber wê li hemberî nexweşiya Koronavîrûsê dikariyan planeke hevbeş çêkin. Lêbelê rêveberiya Şamê xwe nêzîk nake. Hişmendiya wê ev e; eger ev herêm otorîteya min qebûl nakin, ne ji min in. Ango nabêje; yên li van herêman dijîn ew jî welatiyên min in, emê sibê pirsgirêkên xwe çareser bikin, tev de jiyana xwe bidomînin. Hişmendiya wê ev e; eger serdestiya min qebûl nakin bila bimirin. Çawa ku tê dîtin di vê hişmendiyê de mirov ne girîng in, desthilatdarî girîng e.

Gelên li bakur û rojhilatê Sûriyê xwediyên tecrûbeyên girîng in. Salên dirêj di binê nîrê rejima Be´esê de perçiqîn. Di nava pençên DAIŞ û El-Nusra de man. Di dawiyê de herêmên xwe rizgar kirin û gihatin asta ku xwe bixwe bi rê ve bibin. Digel zorî û tineyiyê bûn xwediyên rêveberiyeke hevkar û demokratîk. Ew bixwe biryarên xwe didin. Parastina xwe dikin. Eger xebata Şamê ya dijber û gef û dagîrkeriya Tirkiyê tinebin, wê ev herêm ji bo Rojhilata Navî bibe modeleke demokratîk ya pêşeng. Lêbelê her tim di hedefa gef û xebata dijber de ne.

Li hemberî vê nexweşiyê jî ruhê hevkariyê yê civakî pir balê dikişîne. Gelên bakur û rojhilatê Sûriyê ne bi darê zorê û qedexeyan li hemberî nexweşiyê têkoşînê dikin. Dizanin biryarên rêveberiyan girtîn ji bo wan in û girîng dibînin. Bi gelemperî biryar erênî tên dîtin. Lê di pêkanînê de pirsgirêk hene. Ji ber ku li vê herêmê nexweşî belav nebûye sistayî heye. Lê divê ev nebe sedema xefletê. Tişta ku vê nexweşiyê bixeter dike ew e ku bilez belav dibe. Ji ber wê berî derketina nexweşiyê divê tedbîr bên xurtkirin.

Herêmên xweser li Sûriyê herêmên herî demokratîk û ewle ne. Digel ambargo û dorpêçê sîstema perwerdeyê hat birêxistinkirin. Xizmetgûzarî bi awayekî tê kirin. Mirov dikare bêje ku vê rêveberiyê saxlembûna xwe nîşan da. Lê nahêlin rehet bibe. Her tim di binê tehdîd û tasfiyeyê de digirin. Lêbelê ka heta niha çawa xwe li ser piyan girtine, wê piştî niha jî bi disiplîneke xurttir û birêxstin bikarin li ser piyan bimînin. Hevkariya civakî heye, divê ev bê xurtkirin. Riya vê jî di di zanabûnê re derbas dibe. Bi taybetî divê jin, rewşenbîr, ciwan û yên pêşengî girtîn ser xwe, giraniya xwe bidin ser perwerde û zanakirina gel. Gelekî bidisiplîn û birêxistin her tim avantajên wî pirtir in. Heta ku civakekî şoreşger û demokratîk neyê afirandin destkeftiyên şoreşan nayên parastin. Dibe ku gelek di şer de bi ser bikeve, yan jî firsetên ji konjoktûrê derketîn bi kar bîne û serkeftinan bi dest bixe. Lêbelê destkeftiyên li ser bingehê civakê rûnenin mayînde nabin. Dibe ku bi rengekî rewş bê guhertin, nava destkeftiyan bê valakirin heta bibe dijberê xwe jî. Ev mijar nikarin sistayî û ihmalê qebûl bikin. Divê her tim şiyariyeke şoreşgerî û gera li rêxistinbûnê hebe.

Eger em bala xwe bidinê li Tirkiyê faşîstên weke Erdogan dixwazin krîzan ji bo desthilatdariya xwe bi kar bînin. Jixwe li Sûriyê li herêmên dagîr kirîn vê dikin. Agirbest û nexweşiyê ji bo xwe firset dibînin. Bi hezaran erebeyên tijî leşker û cebilxane şandin Idlibê. Li hundirê Tirkiyê jî şaredariyên ne ji wan dagîr kirin û dixwazin bêjin, ji bilê me ti alternatîfên desthilatdariyê nînin. Ji seranserê dinyayê ji bo girtiyan bangewazî hatin kirin. Gotin, ji bo tenduristiyê girtîgeh bixeter in, girtiyan berdin. Lê Erdogan tersê wê kir. Ev bangewazî kirin behane û dixebite qanûna ku berê nikariye derîne derxe. Û bi vê qanûnê dizan, mafya û sûcdarên din berde. Yên ku divê werin berdan; mûxalif û parêzvanên demokratiyê di hundir de bihêle da bimirin. Ji bo dîktatorên faşîst ya girîng desthilatdariya wan e. Ji bo ku li ser desthilatdariyê bimînin her rê ji bo wan rewa ye.

Gelên bakur û rojhilatê Sûriyê wê van rojên zor bi hevkariyê derbas bikin. Heta niha bû mînakeke baş. Piştî niha jî bi xurtkirina disiplîn û yekîtiyê wê serkeftinên mezintir bi dest bixin.